Paşkoya Taybet bi Boneya
18'mîn Salvegera Şehîdên
Mîkonosê

agiri

Taybet Bi Boneya 26'ê Xermananê, 18 mîn salvegera terora Mîkonosê Hejmar: 143



# Dr. Kendal Nezan di Hevpeyvînek taybetî de

**Dr. Kendal Nezan ji dayîkbûyê Kurdistana Bakûr e û xwendina xwe li warê fîzîkê li Fransayê de bidawî kiriye. Ew niha serokê Enistîtoya Kurd li Parîsê ye. Li gor hevaletî û nizîkatiyek zaf bi her du rêberên şehîd ên PDKÎ, Dr. Qasimlo û Dr. Sadiq şerefkendî re, me bi hewce zanî ku hevpeyvînekê bi vê munasibetê pêre pêk bînin ku em bala we bo aliyê vê radikşînin.**

**Birêz Dr. Kendal Nezan jibo vekirina dergehê basa xwe, ger hinekê li ser çawaniya nasiyarbûn yan hevdu naskirina xwe bi Dr. Sadiq Şerefkendî re jibo me bas bikin?**

Di rê sala 1970'an de hejmara kurdan û bi taybetî ya xwendekarên kurd li Firansayê gelek kêm bûn. Di Newroza 1970'an, ya ku piştî lihevhatina 11'ê adarê, me ji bo cara pêşîn li Parîsê çêkir. Em tevlîhev 12 xwendekarên kurd bûn. Ew jî kurdên bakûr, başûr û yên Sûriyê bûn. Me dizanî ku hin xwendekarên kurd ên Îranê jî li parîsê hene, lê wê demê tirs û xofa Savakê wisa xurt bû ku ew piçekî xwe didan alî, heya ku baweriya wan bi kurdên başûr kêm bû, ji ber peywendiyên navbera Şahê Îranê û tevgera kurdî ya başûr.

Min ji prof. Joyce Blau bihîstîbû ku birayek şaîrekî kurd ê mezin Hejar li Parîsê duktoraya xwe amade dike di kîmyayê de, ku ew kurdekî gelek jêhatî, zana û welatparêz e. Joyce bi xwe, ew di sala 1973 'an, de bi riya mamosta Hejar nas kiribû.

> "Şehîdbûna Dr. Şerefkendî ji bo hemû gelê kurdistanê ziyaneke pirr mezin bû. Gelê kurd di dîroka şerê xwe yê azadiyê de dê navê wî ligel yê Pêşewa Qazî Mihemed û Dr. Qasimlû li rûpelên xwe yên şerefê de bi bîr bîne"

Demek wisa derbas bû, lê ji ber ku em herdû jî gelek bi xwendina xwe mijûl bûn, derfeta hevdu dîtin peyda nebû.

Paşan, rojekê di destpêka havîna 1976'an de min ji rehmetî Dr. Qasimlû pirsa wî kir û xwest ku me bi hev bide nas kirin. Dr. Qasimlû jî hê nû hatibû Parîsê. Piştî çend rojan li min geriya û em bihevre çûn mala rehmetî Nazê Şafiî. Kek Sadiq beriya me hatibû û me li wê derê hevdu nas kir.

Me bihevre şevbêrkeke xweş derbas kir. Berî vegera wî ya Îranê jî me çend caran bi tenê hevdu dît û sohbet kir. Mirovekî pirr dilsoz, nefspiçûk û xwînşîrîn bû û rewşenbîrekî têgihiştî û welatparêz bû. Em zû bûn dostên hev.

**Wekî hevalekî Dr. Seîd û Dr. Qasimlû, te dostayetî û pêwendiya wan bihevre çawan didît û çiqas haydarê xebat û tekoşîna siyasî a wan bûy?**

Dr. Qasimlû dostekî minî nêzîk û ezîz bû. Me bi hev re li ser gelek pirsan sohbet dikir lê li wan demên xebata siyasî ya nihênî min tucar nexwast jê bipirsim: Berpirs an mîlîtanên PDKÎ kî ne, çi dikin? Ew pirîcar behsa berpirsên ku di zindanên Îranê de bûn dikir, wekî rehmetî Ezîz Yûsfî û kek xenî Bilûriyan, min li ser wan û ji bo azadiya wan di rojnameyên Fransî wek Liberalian de çend nivîs û bang belav kirin. Min didît ku Dr. Qasimlû û kek Sadiq hevdu baş nas dikin, lê min ne ji wî ne jî ji Dr. Şerefkendî nepirsî gelo hevkariya wan a siyasî heye an na. Lê min texmîn dikir ku hebû û ku ewê Dr. Şerefkendî di vegera xwe ya Îranê de di ber karên xwe yên zanîngehê de xebata siyasî jî bike.

Gava ku ez dawiya adara 1979'an de ji bo cara pêşîn çûm Îranê, min dît ku texmîna min rast bûye, ji ber ku Dr. Qasimlû û Dr. Şerefkendî bi hev re hatibûn balafirgeha Tehranê pêşwaziya min. Min bi xwe re ekîbeke televîzyona firansî TF1 anîbû ji bo nasandina rewşa nû li kurdistana Îranê. Me bi hev re çend rojên xweş derbas kirin li Tehranê. Ew rêber û mêvandarekî hêja bû. Paşiyê ez bi ekîba televîzyonê re çûm kurdistanê û



> "Dr. Sadiq mirovekî pirr dilsoz, nefspiçûk û xwînşîrîn bû, li haman hal de rewşenbîrekî têgihiştî û welatparêz bû. Em zû bûn dostên hev"

em qasî ku du hefteyan li wir man.

Di vegera Fransayê de me çend reportaj li ser rewşa Kurdistanê di demên helbijartin û di dema şerê Nexedê de belav kirin. Em bi dizî çûbûn kurdistana başûr û li wê derê jî bi ser gundên wêrankirî reportajek anî û ji bo cara yekem di televîzyoneke ewrûpî de belav kir.

**Pêwendî û hevaletiya we wekî sê çalakên siyasî yên kurd li derveyî welat heya çiqas karî alîkar be bo nasandîn û derxistina pirsa kurd li kom û civînên biyanî de? Ger mumkin be nimûneyek?**

Piştî sala 1979'an de ez bi awayekî berdewam bi kek Sadiq re di peyvwendiyê de bûm. Bi taybetî ji bo

www.arsivakurd.org

şandina rojnamevan û doktorên fransî û ewropî. Gelek bîranînnên me yên wan salan hene. Yek ji wan ên ku ji aliyê siyasî ve girîng e ya Kongireya partiya Sosyalîst a Fransayê ya 1980'an bû. Ew kongireyeke gelek girîng bû ji ber ku cara pêşîn di dîroka Fransa ya nêzîk de hêzên çep di helbijartinan de bi ser ketibûn, Francois Mitterand bûbû Serokkomar. Ew ji bo Ewropa û dinyayê jî bûyereke berbiçav bû. Loma ji çar aliyê dinyayê heyetên bi asteke pirr bilind beşdarî wê kongireyê bibûn.

Peywendiyên min li gel partiya Sosyalîst û bi taybetî li gel sekreterê yekem Lionel Jospin û berpirsa peywendiyên navnetewî Vêronique Neiertz gelek baş bûn û min ji wan re got ku di vê dema dîrokî de heyeteke gelê kurd jî dawetê kongrê bikin ewê piştevaniyeke manewî ya mezin bide doza kurdî. Ji ber ku partiyên kurdan hê kêm dihatin nasîn û peyvendiyên navbera wan jî pirî car dijwar bû, me li ser pirensîba "heyeteke gelê kurd" li jêr berpirsiyariya min li hev kir. Min Dr. Qasimlû agehdar kir û pirr kêfa wî hat, got ku ew serketineke siyasî ya mezin e û li ser navê PDKÎ yê Dr Şerefkendî şand. Me li ser navê kurdên Sûriyê jî kek Omer Şêxmûs û wekî kurdê Başûr jî Ehmed Bamernî kir nav heyetê.

Li Kongirê, me kar li nav xwe de belav kiribû, kî here bi kîjan delegasyonê re bikeve peywendiyê, rewşa gelê kurd bi wan bide nas kirin. Di dawiya roja yekem de me dît ku kêm kes xwe didin me.

Roja duwem bûyerek qewimî. Li beşê salonê ji bo heyetên navnetetweyî hatibû veqetandin, dûmanek hilkişiya, qelebalixek çêbû, gotin bombeyek avêtine. Bi carek herkes xwe li ser prdê, hinek li bin kursiyan dirêj kirin. Heres xwe avêtin ser şexsiyetên muhîm ên ku ji Sovyetê û hin welatên din hatibûn. Bi carekê min dengê berpirsekî navdar ê partiya Komunîsta Îtalyayê Giancarlo pajetta bihîst, ku ew mêrxasekî Berxwedana li dijî faşîzmê bû. Diqirîya, digot: "werin li wan tirsonekan binêrin ku dibêjin ewê şoreşa cihanî çêbikin û gava ku çavên wan bi pîçek dûman dikeve, xwe li erdê pij dikin, xwe vedişêrin.


Ez û kek Sadiq em li piya bûn û di sohbeteke germ da bûn. Haya me ji bûyerê nebibû lê em bi dengê pajetta hişyar bûn. Me nihêrt ku tenê em her sê kes li piya ne. (Her du hevalên me yên kurdên din li derva, li kafeteryayê mabûn). Em li piya man paşiyê yek ji heresên serekê heyeta filîstînê, Farûq Qedûmî, rahişt wê "bc mdê" û avête dervayî salonê û piştî demekî rewş vegeriya normalê.

Wê şevê televîzyon û roja din jî rojname fotoyên me her "sê mêrxasên kongreyê yên netirs" belav kirin û em bi carekî "meşhûr" bûn. Kesên ku berê gûh nedidan me, randevû ne didan me bi xwe dihatin, me pîroz dikirin, peywendî datanîn û ser rewşa kurdan agahdarî dixwastin. Me her çiqas got em li piya mabûn ji ber ku haya me ji bûyerê nebû jî, kesî nedixwast bawerî bike, digotin: " kurd nevyên Selehedînê Eyûbî ne, him mêrxas in, him nefsbiçûk in".

Bi kurtî, beşdariya me ya vê kongreyê gelek bi sûd û fayde bû û rê vekir ji bo pêşvebirina peywendiyên bi partiyên Sosyalîst ên Ewropa û yên hemû welatên din.

**Pêwendiya Dr. Seîd li gel hêzên siyasî, rewşenbîr û rojnamevanên derve çawan bû û bi giştî raya we derheq felsefeya jiyan û xebata siyasî a Dr. Sadiq çiye?**

Dr. Şerefkendî, wekî Sekreterê giştî yê PDKÎ dikaribû peywendiyên derve yên partiyê pêşve bibe û têkûztir bike. Li Firansayê, li nav hêzên siyasî, li nav rewşenbîrên kurd, duktor û rojnamevanên Firansî yên dostên kurdan gelek jê hez dikirin, qederê wî digir in. Di nav Entirnasyenola Sosyalîst de jî hat nasîn, valahiya mezin a ku bi Şehîdbûna Dr. Qasimlû peyda bibû heya asteka baş dagirt û bibû hêviyek mezin ji bo kurdên Îranê û ji bo hemû doza kurdî.



"Wê şevê televîzyon û roja din jî rojnaman, fotoyên me her "sê mêrxasên Kongreyê yên netirs" belav kirin û em bi carekî "meşhûr" bûn"

Peywendiyên me dostane bûn, brayane bûn. Her cara ku ew dihat Parîsê, me dûr û dirêj sohbet dikir li ser rewşa Îranê, li ser bernameya wî. Di tîrmeha 1990'an de enistîtuya kurdî tevî Enistîtuya Marksîzm-Lenînîzmê ya 1500 kes beşdarî konferansê bûn. Me Dr. Şerefkendî bi awayekî fermî vexwend Konferansê û li wir axiftineke hêja kir, bi kurdên Sovyetê, Rojhilat û doza kurdî baştir bidin nasîn.

"Sadeyî û nefsbiçûkî li welatên demokratîk ên Ewropa de fazîletek in, lê li Rojhelata Navîn a xwîndar de ku kuştin bûye rûtineke rejîmên dîktatorî, kêmasî û şaşiyeke siyasî ye"

Çavpêketina me ya dawîn di meha îlona 1992'an de li Parîsê pêk hat. Berî ku here Kongireya Enternatyonala Sosyalist ya Berlînê, dixwast ku em hinek sohbet bikin. Me hevdu li qehwexaneyek nêzîkî meydana Chatelet ya Parîsê dît. Ez çend deqîqe berî wextê xwe hatibûm. Min dît ku wa ye ew bi tenê ji metroyê derket û hat. Ez gelek aciz bûm, min got: kek sadiq, di bextê te de, hûn çewa xeletiyên wisa dikin. Tu serokê partiyeke kurdî ya mezin î, lîderê milletekî yî, li dijî rejîmeke hov û xwînrêj şer dikî. Mafê te nîne ku weke xwendekarekî an wekî mirovekî serbixwe û sade yî wek min bi metroyê werî.

Mirin li pêşiya me hemûyan e, lê nabe ku mirov wisa bi dilên dijminên xwe xweş bike".

Keniya û got:! kek Kendal, xem nexwe tiştek bimin nabe, gava ku haya rejîmê ji bernameya min tunebe, nikarin tiştekî bikin. Di aliyê din de jî, gava rejîm bixwaze yekî bikuje, tu çare nin e, ewê pirojeya xwe bibe serî, nimûneya Şapûr Bextiyar ewê mezin, lê însanekî sade û nefspiçûk bû.

Felsefeya jiyan û têkoşînê ya Dr. Şerefkendî bi kurtî wisa bû. Ev rewşenbîr û siyasetmedarekî hêja û mezin, lê însanekî pirr sade û nefspiçûk bû.

Sadeyî û nefsbiçûkî li welatên demokratîk ên Ewropa de fazîletek in, lê li Rojhelata Navîn a xwîndar a ku têde kuştin bûye rûtineke rejîmên dîktatorî, kêmasî û şaşiyeke siyasî ye. Em tu car ji bîr nekin ku em li softeya guran in.

Şehîdbûna Dr. Şerefkendî ji bo hemû gelê kurdistanê ziyaneke pirr mezin bû. Ewê gelê kurd di dîroka şerê xwe yê azadiyê de navê wî ligel yên pêşewa Qazî Mihemed û Dr. Qasimlû li rûpelên xwe yên şerefê de bi bîr bîne.

www.arsivakurdi.org

Parêzer Luqman Mêhrfer di gotobêjek taybetî de:

# Dezgeha dijîsîxoriya Birîtaniya “Întêlêcênt Sêrwîs”, cihê bikujên Şerefkendî eşkere kir

**Hevpeyvîn: Kurdistan**

18 sal bi ser karesata Mîkonosê ku têde rêberê jêhatî yê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, Dr. Seîd Şerefkendî û hevalên wî ji aliyê terorîstên Komara Îslamî ve hatin şehîdkirin, derbaz dibe. terorek ku piştre dadgeha Mîkonosê di 21 ê Xakelêweya sala 1376 a Rojî de, Komara Îslamî bi tawanbarê sereke ên wê cinayetê da nasandin. Me ji bo bidestxistina zaniyariyên zêdetir, hevpeyvînek taybetî tevî Parêzer û herweha endamê Komîteya navendî yê PDKÎ, birêz Luqman Mêhrfer di vê pêwendiyê de encam da.

**Birêz Luqman Mêhrfer, we di 15 mîn salvegera şehîdbûna Dr. Şerefkendî û hevalên wî de, pirtûka “Mîkonos, bikujên Şerefkendî şermezar dike” belav kir. Ji kerema xwe hûn dikarin bêjin ku çawa bû bîrokeya nivîsandina wê pirtûkê ji cem we çêbû?**

B: Her xwendevanek di qonaxa çarim a zanîngehê de gerek basekê pêşkêş bike. Bi hevahengîkirin û rapirsîn tevî mamostayên zanîngehê basek bo min hat diyarîkirin bi navê, “berpirsayetiya dewletê li terora siyasî di asta yasaya navnetewî û yasaya navxweyî de, “Şerefkendî bo mînak”. Piştre biryar bû ku ev bibe bingeha têza macistera min ”foq lîsans” ku mixabin seba hin pirsgirêkên siyasî û teşkîlatî, min nekarî xwendina xwe bidomînin. Lê liser daxwaza hin ji mamosta û hevalên min bû ku ez handam wê basê dewlemendtir bikim û bikim pirtûk. Min jî ji ber sê sedeman dest avête pênûsê.

Yekem: Basa han pêywendî bi pirsa Kurd heye. Di derbazbûyî de gelê Kurd nekariye yan derfet bo çênebûye dîroka xwe wek xwe binivîsîne. Ewa ku jêre jî hatiye nivîsandin, biyaniyan nivîsandiye, bêguman ewe jî bê kêmasî nine. ji ber ku nivîskar zanyariyên dirust û pêwîst li ser wê pirsê nebûye û şarezayê zimanê wî netewî jî nebûye, lewma pirraniya caran li encama wê yekê ku wergêr nekariye bûyera qewmî weke xwe bibêje, seba nezaniya ziman yan bi meremek baş tiştê pêwîst jêre negotiye, kêm û kasî ketine nav bûyerên dîrokê de.


Dûyem: Girîngîdan bi vê basê ye, ku min jêvebû li ser wê basa han kêm hatiye nivîsandin. Niha jî ez li ser wê bawerê me, çimku diyardeya terorê pêwîste pêtir li ser bihê nivîsandin, bi taybetî ku teror bo Komara Îslamî her di destpêka hatineserkara wê rejîmê de, bûye sitratijiyek bingehîn bo gihîştin bi armancên xwe ên qirêj. Lewra heq waye ku vekolînek zanistî li ser bihê kirin. Min xwastiye bi nivîsandina wê pirtûkê kesên dîroknivîs, vekoler, şarezayên warê siyasî û yasayê han bidim ku bi xameyek bihêztir û şarezayiyek pêtir wê basê dewlemendtir bikin û aliyên yasayî û zanistî ên wê şirove bikin.

Sêyem: Min bi erkê ser milên xwe zanî ku ji aliyekê rêz ji xebat û tekoşîna Şerefkendiyê rêber bigrim ku beşek ji dîroka Partiya Demokrat û bizava rizgarîxwaziya Kurd e. Ji aliyek din ve jî hevkariyek be bo dewlemendkirina arşîva pirtûkxaneya kurdî.

**Çend roj ji karesata Mîkonosê derbaz bibû ku dezgeha dijesîxuriya Birîtaniyayê “Întêlêcênt Sêrwîs” bi dezgeha hevast a xwe ragihand ku gumanlêkiriyên ku heya wê demê jî nehatibûn dîtin, xwe ji kuderê veşartine. Kêmtir bas ji wê helwêsta Birîtaniyayê hatiye kirin. Hûn wê helwêsta Berîtaniyayê çiqas bi bandor dizanin di pêvajoya pêşveçûna wê dosyayê de?**

Bêguman zanyariyên Birîtaniyayê û belgeyên hewce faktên bihêz bûn bo polîsê Almaniya seba selimandina wê cînayetê ku ji aliyê terorîstên Komara Îslamî ve li Birlîna Almaniya hatibû encamdan, ew jî vedigere bo wê demê ku bajarê Berlînê di bin kuntirola çar dewletên hevpeyman de bû “ Amerîka, Birîtanya, Firansa û Sovyeta berê” her yek ji wan dewletan kar û barên xelkê bin desthilata xwe de çavdêrî dikir. Bi wî awayî, Kazim Darabî di bin çavdêriya dezgeha zaniyariya Birîtaniyayê ku bi navê “Întêlîcênt Sîros” bi navdeng e, hatiye kuntirolkirin û herwiha telefona wî jî hatibû kontirolkirin. çimkû “M, A, 6” Kazim Darabî bi endamê fermî yê Sipaha Pasdaran a Îranê zanîbû ku mijûlê karê sîxurî û pêkanîna torek terorîstî bû piştî hiloşîna dîwarê Birlînê û hevgirtina du beşên Almanya û bidawîhatina dagîrkirina Birlînê. Dezgeha zanyariya Birîtanyayê, berî ku Birlînê bi cih bihêle, tev fakt û zanyariyek ku li ser kar û barên Kazim Darabî û hevkarên wî hebûn, dabûn polîsê Almanya û ew agehdar kiribûn ku Komara Îslamî a Îranê pîlanek ji bo kuştina rêberên bizava Kurd di dest de heye, ku gelaleya wê pîlanê bi navê “remzi“ Bizurgi Elewî” li balyozxaneya Îranê li Bonê hatiye darêtin.

**Di pêvajoya mehkemekirinê de hat xuyakirin ku Komara Îslamî a Îranê gelek hewl dane ku hem dewleta Almanya bi armanca sekinandina dozgeriyê bixe bin givaşan û hem jî temahê bide dozgerê perwendeya Mîkonosê heya ku biryarek çewaşekarane û bi qazancê wê rejîme der bike. Gelo ew givaş û temahxistine ji bo rohnkirina bikujan û biryarderên wê cînayetê çi bandorek hebû?**



“Min bi erkê ser milên xwe zanî ku ji aliyekê rêz ji xebat û tekoşîna Şerefkendiyê rêber bigrim ku beşek e ji dîroka Partiya Demokrat û bizava rizgarîxwaziya Kurd”

Na, çimku dezgeha dadê ya Almanya erkê nîştimanî û yasayî yê xwe di kopika hêjayî û wêrekiyê de bi cih anî û ji tu asteng û gefekê nesilkî, lêpirsîn û vekolîn, pêvajoya asayî û usûlî a xwe bi arasteya heq û dadperweriyê de derbaz kir ku di encam de 5 kes ji tawanbarên beşdar di kiryara Mîkonosê de hatin girtin û hatin hepskirin û piştre jî biryarder û encamderên sereke ên wê cînayetê bi cîhanê dan nasandin. Di vir de, dozgerê giştî yê Almanya “ Eliksandir Xunîştal” rolek biwêrane lîst, bi kiryar xweseriya Dezgeha Dadê a Almanyayê bi raya giştî re da xuyakirin.

**Tê gotin ku yekgirtin û yekdengiya opozîsyona Komara Îslamî ji bo bi encamgihandina wê dozê pirr berçav bû? Gelo Komara Îslamî pêşbîniya wê hevgirtinê dikir? Gelo hevgirtinek han bandorek erênî li ser pêvajoya dosyayê çê kir?**

### “wê biryarê bo raya giştî derxist ku Komara Îslamî, raste di kinc û cil û bergek olî de ye, lê hikûmetek cînayetkar û dijî yasayî ye û tevî civaka serdem hev nagire”

Belê yekgirtin û tekoşîna opozîsyona Îranî bandora xwe li ser pêvajoya pêşdeçûna dozgeriyê hebû, çimku ew xesar tenê ji Partiya Demokrat û bizava Kurd neketibû, ew derbe ji hemû opozîsyona Îranî û bizava seranseriya Îranê ketibû. Komara Îslamî jî baş dizanî ger Şerefkendî di jiyanê de bimîne, dê hewla pêkanîna eniyek yekgirtî de be. Ligor wan taybetmendiyên ku Şerefkendî hebûne, ji mandînenasiyê, hêjayî û siyasîbûna wî de guman tune bû ku di wî karî de dê serbikeve, ew jî metirsiyek mezin bû ku gef ji berjewendiyên rejîma kevneperest dixwar. Lewma biryara kuştina wî da. Me dît ku Şerefkendî her di civînek opozîsyona Îranî de hat şehîdkirin. Ez dikarim bêjim ku bingeha wê civînê bû bi hêvênê hevgirtin û yekdengî û yekhelwîstî a opozîsyonê bo piştevanîkirin ji serkevtina dozgeriya Mîkonosê dijî zordarî û terorîzma navdewletî.

**Belavokên Almanya, pêvajoya dozgeriya Mîkonosê û ber bipêşdeçûna wê perwendeyê kiribûne mijarekî sereke û pirraniya caran bi belavkirina hin ji belgeyan, pêşî ji berxwarkirina pêvajoya perwendê digirtin. hûn wê yeke çawa dinirxînin?**

Di her welatekê de ku piroseya demokrasiyê cîhgîr be, hikûmetek demokratîk li ser kar be û yasa serwer be, tevahiya navendên desthilatê xwediyê kesayetiya hiqûqî û manewî yên xwe dibin û her yek ji wan di warê erk û desthilata xwe de, rola sereke yên xwe dilîze. Ragihandin jî ku weke desthilata çaremîn tê hesibandin, di welatên demokratîk de, mirov dikare bêje rolek berçav dilîze di rohnkirina rastiyan û berevanîkirin ji zulm û çewaşekariyan. Lewra çapemenî û ragihandinên Almanya, rolek bibandor lîstin di berevanîkirin ji rêderçûna pêvajoya yasayî û biryardana dadperwerane a dozgeriyê û hukmê dadgehê di dozgeriya Mîkonosê de.

**Tê gotin sedema sereke a pêşdeçûna dozgeriyê û şermezarbûna bikujan û biryarderên wê, xweseriya hêza dadwerî a Almanya ji hêza birêvebiriya wî welatî ye. Raya we di wî warî de çiye?**

Sirûştî ye ku rola dezgeha dadê di peywendî ligel doza Mîkonosê de girîng û pirr bayex e, eva tiştek nine ku bihê înkarkirin. Rola sereke di wê pirsê de, dezgeha qezayî ya Amanya lîstiye. Lê gişt sedemên din di pirsyarên berê de min amaje pê kir, hevkariya derekî pirr baş bû, çi di warê zanyariyan û çi di warê manewî û maddî de bo pêşdebirin û serkevtina pêvajoya dozgeriyê.

**Mirov dikare bêje hêza dozger a xweser bi bê hişyariya xelkê piştevanê hêzên givaş yan givaşanîna belavok û ragihandinan, nedikarî serkevtinek wa bidest bixe?**

Ger hêza dozgeriyê xweser be, bi wê manayê ye ku di vî welatî de piroseya demokrasiyê têde cihgîr bûye. Ku wisan bû civakek azad e û asta hişyariya xelkê jî jorde ye, lewra di welatên han de ragihandin rolên xwe bi başî bicî digehînin û dadger bi erkê xwe re şareza ye û pêvajoya yasayî û exlaqî a xwe bi cih tîne, kospek siyasî yan abûrî ... pêşiya xwe de nabîne. Çimku desthilat dest di karên hevdu wernadin. Bi nîsbet dadgeha mîkonosê jî çimku Komara Îslamî givaşek zaf anî ser hikûmeta Almanya ku bikare pêşiyê ji pêkanîna dozgerî û hukmê dozgeriya Mîkonosê bigre, wira rola çapemenî û ragihandinên giştî ji hişyarkirine xelkê sedemek girîng bû bo eşkerkirna pîlanên rejîmê, di bilezxistina piroseya dozgeriyê. Çimku ger ew rola bibandor neba, renge ew piroseye bi wî awayî serkevtî neba.

**Biryara dozgeriya Mîkonosê, di niha de çi bandorek li ser Komara Îslamî kiriye? Gelo cîhan dê bikare wê biryara dîrokî jibîr bike?**

cihwarê dozgeriya Mîkonosê hevkariya gelên Îranê bû, dengê nerazîtiya bihevre ya azadîxwazên cîhanê ye ku jihev hatiye girêdan, ew dozgeriye di rastî de bi manaya tewawbûna pirsa mehkemiyeta bikujan nebû ku di wê dozgeriyê de bûn. Ew dozgerî di rastî de mehkemekirina Komara Îslamî di asta navnetewî de bû. Ew dozgerî yekemîn dukumênta navnetewî ye ku bû bingehek bihêz û qahîm çi ji bo niha û çi pêşerojê ku serdarên payebilind ên Komara Îslamî a Îranê di dozgeriyek navnetewî de bihên mehkemekirin û ew pirs bibe pirsek navnetewî û biryar û birêveberên wê cînayetê bi cîhanê hatine naskirin. Çimku dozgeriya Mîkonosê ew rastîyan kir ku mesele tenê Mîkonos nine, belkî peywendî bi perwendeyên hin ji kesên opozîsyona Îranê ve heye, ku li Almaniya û Ewropayê hatin teror kirin. Mînak Dr, Ebdulrehman Qasimlû di 22 ê Pûşpera sala 1368 a Rojî li Vîyenê. Di wir de vekolîn bi nivîşkanî man. Perwende hatin girêdan yan jî vekolîn jê nehat kirin. Rastiya Mîkonosê vê yekê nîşan dide ku ew perwen de di destpêkde bihên vekirin û bikare ji cînayetên rejîmê vekolînê bike û tawanbar bihên mehkemekirin. Di warê yasayî ve û di warê exlaqî ve jî ez nebawerim ku civaka mirovahiyê tucar wê biryara dîrokî jibîr bike. Çimku wê biryarê bo raya giştî derxist ku Komara Îslamî, raste di kine û cil û bergek olî de ye, lê hikûmetek cînayetkar û dijî yasayî ye û tevî civaka serdem hev nagire.

## 18’emîn salvegera şehîdên Mîkonosê li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ di rê û resmekê de hat bibîranîn

Roja 17’ê Îlona 2010’an, bi hinceta 18’emîn salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî bi destên terorîstên Komara Îslamî a Îranê, rê û resmek bi beşdariya endamên rêberiya PDKÎ, kadro û pêşmerge û malbatên pêşmergan û mêvanan, li binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ hat lidarxistin.

Ev rê û resme bi xwendina sirûda netewî a “Ey Reqîb”ê û deqîqeyek bêdengî bû rêzgirtin ji canê paqijê şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê dest pê kir.

Her bi vê hilkevtê, Hesen Şerefî, cîgirê Sekreterê Giştî, ji aliyê Deftera Siyasî a PDKÎ ve peyamek pêşkêş kir. Navhatî di axaftina xwe de îşare bi pîlanên Komara Îslamî wek terorkirina rêberan û bi dehan kadro û pêşmergên partiyê, êrîşkirin û topbarankirin û çêkirina astengên cur bi cur kir û, li ser wê yekê tekez kir ku PDKÎ bi ser hemû astengan û berbestan ser dikeve û bi bêrawestan dom bi xebat û berxwedana xwe bo bidestveanîna mafên gelê Kurd li Kurdistana Îranê dide.

Herwiha di vê rê û resmê de, peyama hevbeş a Yekêtiya Ciwanan, jinan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistana Îranê hat xwendin.



Hêjayî gotinê ye, di vê rê û resmê de, çend sirûd û pexşan bi vê helkevtê hatin pêşkêşkirin.

www.arsivakurd.org